

Guherînên di Zaravayê Kurmanciyê de: Pirsgireka Zayendê

Salih Akn*

Wek hemû zimanan, zimanê kurdî jî digihure. Guherîn ku bo zimanan bûyerên pîr normal in bi gelekî sedeman tên îzahkirin. Zimanas 3 faktorên guherînê destnîşan kirine (Dubois, 1994, r.507). Yekemîn faktor giradayê coxrafayê ye. Ji hev dûrbûna axîfêrên zimanek dibin sedemên guherînên peyvan, deng an jî guherînên avasaziyê. Dema ku axîfêrên zimanek, ji sedemên coxrafî, nikarin hevûdû bibînin, û nikarin bi hev re bipeyivîn, ev di pêvajoyek dûr û dirêj de gelekî guherînan bi xwe re tîne. Zimanê fransî ku li her çar aliyê dinyayê tê axaftin nimûneyeke balkêş e. Fransiya ku li Afrîkayê, li Québec (Kanada), li giravên wek Antilles, La Réunion û hvd. tê axaftin di gelekî waran de (peyvsazî, dengnasî,) cûda ye. Lê fransiyê ku li Fransayê bi xwe jî tê axaftin li gor navçe û bajaran dikare cûdatiyan nişanbide. Faktora coxrafî di guherînên zimanê kurdî de jî eşkere ye. Yek ji sedemên pîrzaraviya zimanê kurdî û ku ev zarave hev çend ji hev dûr ketine bi gûman bi faktora coxrafî ve girada ye. Lê guherîn di nav zaravayan de jî peyda dibin. Wek nimune, *devoka Botan*, *devoka Xerza*, *devoka Serhedê*, û hvd. danîşana guherînên zaravayê kurmanciyê ne. Faktora demê, duyemîn sedem e ku zimanek pê digihure. Di pêvajoya pêşveçûna mirov û civatan de, ziman jî xwe adapte ya wan dike. Çawa zimanê tirkîya îro û heştê sal berê ne wek hev e, zimanê kurdi ya 1787ê jî ne wekê zimanê ye ku îro em pê dîpeyivin.¹ Sêyemîn faktora guherînê ji sedemên sosyal pêk tê. Ziman di nav civatê de jî diguhere. Zimanê ku gûndî, bajarî, an jî kesên hêjar û dew-

* Universiteya Rouenê, akademîsyen.

1- Binêrin M. Garzonî "Grammatica e Vocabolario della Lingua Kurda" (Rêziman û peyvên zimanê kurdî), Roma, 1787, 288 r.

lemend pê dipeyvîvîn, zimanê xortan, zimanê nivîskar û rojnamevanan di gelekî waran de guherîn nîşan didin.

Hêjayê gotinê ye ku ev guherîn di zimanên standard de û xwedî dezgehên parastîne ne de diqewimin. Ev faktorên ku zimannasan destnîşan kirine faktorên herî giştî ne, ku di hemû zimanan de peyda dibin. Em baş dizanin ku rewşa zimanan a taybetî jî dibe sedemên guherînan. Statûya fermî û sosyal a ziman, hebûn an nebûna dezgehên parastîne û perwerdeyê, hebûn an nebûna amûrên ragihandinê (radyo, TV, rojname, û hvd.), kontakta zimanan bandoreke xurt li ser bikaranîna zimanan dikin ku dikarin bibin encamên gelekî guherînan. Gelo ev bandor di zaravaya kurmanjîyê de çawa xwe nîşandide? Em dixwazin di vê nivîsê de pîranî li ser guherîneke ku di zaravayê kurmanjîyê de diqewime rawestînin. Em dikarin mijara ku emê binirxînin bi melûlbûn an jî bi têkçûna zayendê binavbikin.

Wek tê zanin, zayend kategoriyeke rêzimanî ye. Herçiqas guherînen peyvsazî û dengsazî di zimanan de buyerên herî normal bin, guherîna kategoriyeke rêzimanî pîr îstîsna ye, buyereke awarte ye. Ew xwedî bandorekî ye ku xwe bi giştî di avasaziya (strûktûr) zimên de diyar dike. Ev gotar, ku ji sê beşan pêk tê, dê faktorên ku di melûlbûn / têkçûna zayendê di rolek listine bikole û binirxîne. Di beşa yekan de, ezê li ser pîrsa zayendê di çend zimanan de bisekinim. Di beşa diduyan de, ezê dîtînen rêzimanasên kurd li ser zayendê pêşkeş bikim. Beşa sîsiyan jî lêkolîn û ji encamên vê lêkolînê pêk te. Hewce ye gotinê ye ku ev lêkolîn di devoka bajarê Hezzoyê (Kozluk) de hatiye lidarxistin.

1. Zayend di Çend Zimanan de

Di zimanên ku xwedî zayendê ne de, zayend wekî kategoriyeke rêzimanî ku bêjêyan di klasên navan de belavdike xuya dibe (Dubois û yêndin, 1974, r.229). Ev belavkirin li gor hin xîsusiyetên formel in ku xwe di cinavk (pronav), lihevhatina rengder, lêker û veqetandekan de diyar dikin. Fonksiyona zayendê nişandana cînsê peyvîvîn û avasazî kirina wan di kategoriyan de ye.

Zimanên du zayendî, wek fransî, îtalî, îspanyolî, heyîyan di kategoriyeke nêr û mêyan de belav dikin. Zimanên sê zayendî, wek latînî, elmanî, rusî, kategoriyeke sêyem hene ku ew jî nêtar e. Wekê ku ji etîmolojî ya wê jî tê fêhm kirin, nêtar ne mêr û ne jî mê ye. Lê divê bê zanîn ku hebûna zayendê xîsusiyeteke gerdûniya zimanan nîne. Di zimanên çînî, japonî, tirkî, finî û macarî de, zayend tune ye.

Du celebên zayendê hene: zayenda xwezayî û zayenda rêzimanî.
Em baş dizanin ku zayenda xwezayî cînsê heyîyên zînde destnî-

şan dike û wan di du kategoriyan de cuda dike : heyiyên mê û heyiyên nêr (*xwişk / bira, keç / kur, met / ap, dotmam / pismam, beran / mîh, dîk / mirîşk*). Di van mînakên de, zayendên xweza-yî yê peyvan hene û di bikaranîna xwe de nabin sedemê tevliheviyê, ji ber ku mirov dizane ku *xwişk* mê ye û *bira* nêr e.

Lê zayenda rêzimanî, ji bo heyiyên nezînde, ji bo tiştan tê bikaranîn (*dar, pîrtûk, mal*). Pirsêka herî giring a zayenda rêzimanî belavkirin û dayîna wê ye. Mirov dikare bipirse ka li gor kîjan kirîter û pîvanan hin tişt dibin mê û hin tiştên din dibin nêr. Ango, çima *dest* nêr e û *pişt* mê ye, çima *nan* û *goşt* nêr in *berf* û *baran* mê ne?

Dîtina giştî ya zimannasan ew e ku mirov nikare ji alî maneya tiştan ve bingehekê mentiqî ji bo piraniya peyvên nêr û mê peyda bike (Chiss û yê din, 1978). Wisa xwiya ye ku sîstema qedr û qîmetê ku her ziman ji tiştan re nîşand dide rolekê mezin listiye. Li gor zimannasê fransî Arrivé, «bi awakî giştî, zimanê fransî, tiştên mezin ên nêr li dijî tiştên piçûk ên mê derdixe». (Arrivé û yê din, r.285). Ev buyer di kurmanciyê de jî peyda dibe: li gor Bedir Xan, tiştên konkret ên blind, pozik û derketî nêr in. Piraniya tiştên kul, çal, qef û rast mê ne (Bedir Khan & Lescot, 1991, r.66-67).

2. Fonksiyona Cihêkirin û a Avasazî Kirina Zayendê

Herçiqas mirov nikaribe bingehekê mentiqî ji bo belavkirina zayenda rêzimanî peyda bike jî, hewce ye ku em du fonksiyonên wê destnîşan bikin. Fonksiyona yekem ew e ku zayend tevliheviyê ji bo peyvên hevdeng ji holê radike. Di fransiyê de, peyvên *père* (bav) û *paire* (cot) bi yek awayê tîna bilêvkirin (PER). Lê zayenda wan rê nade tevliheviyê, ji ber ku *père* bi zayenda nêr (*le père*) û *paire* bi zayenda mê (*la paire*) tîna bikaranîn. Ev fonksiyon di kurmanciyê de jî peyda dibe. Guherîna zayendê bêjeyek dibe sedemê manayekê din: dema *dar* bi mana dara heşîn e mê ye (*dara sêvê*), lê dema *dar* bi mana darê hişk e nêr e (*vi darê bi-de min*).

Fonksiyona duyem ew e ku zayend, bi dawînen xwe, pêyvên zimanê bi avasazî dike. Di fransiyê de, di navbera dawîneya navan û zayenda wan de, her tim peyvendiyekek heye. Li gor, J. Dubois, ev peyvendi, rêz kirin û avasazî kirina peyvan hêsantir dike û dibe sedemê avakirina “mîkro-sîstemekê peyvsazi” yê (1965, r.54). Her wiha, di fransiyê de, peyvên ku bi dawînen – *tion*, - *ade*, - *aie*, - *aison*, - *ance*, - *etée* bi dawî dibin piranî mê ne. Peyvên ku bi dawînen – *age*, - *ail*, - *ard*, - *at*, - *eau*, - *and*, - *er* dawî dibin nêr in.

Di zimanê rusî de, dawînên - a – Я (ya) ji bo peyvên mê tên bikaranîn. Dawînê – â (yê) ji bo peyvên nêr û dawînên – o – e ji bo peyvên notr (nêtar) tên bikaranîn.

Di kurmanci yê de em dizanin ku tenê peyvên ku bi dawînê – î (azadî, aşî) û lêkerên ku wek súbstantîf (çûna we, dîtina min) tên bikaranîn mê ne. Wekê din, strûktura bêjeyan zayenda xwe diyar nake.

3. Çend Şîroveyên Rêzimannasên Kurd Li Ser Pirsra Zayendê

Berê ku em şîroveyên rêzimannasên kurd li ser zayendê binirxînin, em binêrin ka zayenda bêjeyan çawan di ferhangan tê nişandan. Bi awayekî giştî, nişandana zayendê di ferhangan de ne sistematîk e. Wek nimune, ferhanga D. Îzolî (1992) û ferhanga Torî (1999) zayendê bêjeyan nanivîşînin. Mîrov dikare bigihîje wê encamê ku nişandana zayendê ji bo van ferhengnasan ne girîng e.

Di pîrtûkên rêzimanê kurmançiyê de, pirsra zayendê bi awakî sivik tê şîrove kirin. Problemên li dor xwiyakirina wê ya morfolojîk, belavkirina wê û gelekî awarte ji bo rêzimannasên kurd pirsgirekên mezin in. Çend rêzimanên ku me bi wan şewirî (Aykoç, 1996, Bedir Xan & Lescot, 1991, Blau & Barak, 1999, Kurdo, 1991, Keça Kurd, 2000) pirsgirekên li ser hebûna zayendê û li ser kêrhatiya wê ya di avasaziya kurmançiyê de zelal nekirin.

Di zaravayên zimanê kurdî de, kurmançî, zazakî û goranî zayendê bikartînin. Lê zayend di zaravayê soranî de ji sala 1930yan û vir vê nayê bikaranîn. Dema ku kurmançî (*bavê min, gula sor*) bikartîne, soranî (*bavî min, gulî sor*) bikartîne. Di soraniye de pêyvên nêr û mê tenê bi veqetendekê [î] tên tewandin.

Emê ji van rêzimanên jorîn du çavdêrî an du encam hilbigrin. Yek ji wan di kurmançiyê de frekansa peyvên mê ye. Li gor Bedir Xan û Lescot, ev frekans ji frekansa peyvên nêr pirr zêdetir e (1991, r.66). Lê pirr balkeş e ku di devoka Hezroyê de, mêtî ji holê rabûye û hemu peyv bi zayenda nêr tên tewandin. Encama din jî di kurmançiyê de «prestîja zimannasî» ya bikaranîna zayendê ye. Zayend wek dewlemendiyekê kurmançiyê tê qebûl kirin. F. M. Aykoç, piştî ku ew radigihîne ku zayend di zarava û devokên soranî, goranî, mukrî û feylî de melûl bûye an jî ji wan têkçûye, wiha dinivîşîne : «*Di Kurmançiyê de zayend bi bingehî runiştîye, dema ku yek bê zayend biaxîfe, jê rind nayê fêmkirin, biyanî xuya dike. Bo kurmançiyek zelal, divê zayend bê bikaranîn*» (1996, r.103). Li gor wî, kesên ku zayendê bikarnaynin biyanî ne. Vêca, emê çawan bi sed hezaran, bi milyonan kurmançixêfên ku zayendê bikarnaynin wek biyanî bipejirînin?

4. Zayend di Devoka Hezzoyê de

Hezzo navçeyekî Êlihê (Batmanê) ye. Li bakura rojhilata Êlihê ye û 60 km jê dûr e. Mirov dikare Kurmanjiyâ li Hezzoyê tê axaftin wek devokek xerzî binavbike. Xerzî li deverên Xerzan, ango li bajar û gundên ku di navberê deşt û çemê Xerzan de ne tê axaftin (Êlih, Misirc, Bêşîrî, Hezzo).

Çawkaniyên ku em ji bo vê lêkolînê bikartînin ji transkiriba çend gotûbêj û ji e-mailan pêk te. Me bi şeş kesên (2 jin û 4 mêr) ku li Hezzoyê bûne û li wê mezin bûne re hevpeyvîn çêkir. Jin tu car neçûne dibistanê û tirkî baş napeyivin. Li aliyê din, mêr tirkî dizanin û çûne dibistanê. Sê e-mailên ku axîfêrên mêr ji me re şandine jî di çawkaniyan de cîh digrin. Hêjayê gotinê ye ku di vê lêkolînê de armanca me ne lêkolîneke mîqdarî ye. Loma dê encamên vê lêkolînê hemû devoka Hezzoyê temsîl neke. Em tenê dixwazin guherînan di zayendê de diqewimin bi awayeke zimannasî binirxînin. Çawa ku emê bibînin, ev guherînan di gelekî devokên din de jî peyda dibin.

Di devoka Hezzoyê de, zayenda rêzimanî di pêvajoyê têkçûnê de ye. Zayenda xwezayî (tebî) berdeyam e. Em li çend hevokên ku me ji çawkanîya devoka Hezzoyê berhev kirine binêrin.

ez fedikirim ku çêlekik û bizinkî li banê me hene /.../ bizinkî wi-sa mezin

Em dizanin ku bizin zayenda mê heye, ji ber ku ev zayenda xwezayî ye. Lê di vê hevokê de, ew bi zayenda nêr hatiye tewandin.

çawa nî başî rewşê we çawa ne / daxwazê me ew e xanî ne histîne

Bêjeyen rewş û daxwaz di kurmanciyê de mê ne, lê di vê hevokê de, nêr xwiya dikin. Melûlbûna zayendê ne tenê ji bo peyvan e, her weha civanka mê wê jî di devoka Hezzoyê de dibe wî.

dîyê te îxtiyarê, dilê wî ne eşîne

Gulçîn jinarê me ye / ez û kurê wî em ji zarokatîyê ve heval in

Ger zayenda rêzimanî di van nimuneyan de têk çûbe, divê em du awartan destnîşan bikin. Ew bi xwe jî di dema borî de hebûn û bikaranîna zayendê di devoka Hezzoyê de eşkere dikin. Yekem awarte, bikaranîna tewangê bangê (vokatîf) *lo / lê* ye. Ew li gor cînsê zimanaxêfan tên tewandin: *lo mirovo, lo şivano, lê keçê, lê delalê*. Ev cudayetî di devoka Hezzoyê de her tim fonksiyonel e. Awarteya duyem jî hebûna zayenda xwezayî ye. Bêjeyên malbatî û mirovatîyê wek *bav / dê, ap / xal / xatî, bira / xwişk*, her tim hene, lê divê bê zanîn ku ew tev bi veqetendekê zayenda nêr tên tewandin (*dîyê min*). Di warê cudakirina cînsê heywanan de jî, şopê zayendê diyar e. Ango, ji bo peyvên duzayend (nêremê)

ku ji heywanên xwedî yek nav in tên bikaranîn, rengderên *nêr û mê* cînsê wan zelal dike: *kerê nêr, kerê mê, hirçê nêr, hirçê mê*.

5. Nirxandin

Ger em nimuneyan bi awakî kurteyî binirxînin, em digihîjin van encaman: Cîhê kurmanciya standart veqetandekê binavkirî [a] hewce dike, devoka Hezroyê [ê] bikartîne: *daxwazê me*. Dema ku kurmanciya standart veqetandekê nebinavkirî [ekê] hewce dike, ev devok [ekî] bikartîne: *bizînkî wisa mezin*. Her wiha, cinavka wê jî dibe *wî*.

Mirov dikare bigihîje wê encamê ku tewandina navekî xwedî zayenda mê bi zayenda nêr dibe sedemê tevliheviyekê. Lê ji ber ku nêrtî, bê îstîsna, ji bo navên mê û nêr tê bikaranîn, ew dibe kategoriyekê nêtar.

Em baş dizanin ku ev melûlbûn / têkçûna zayendê ne tenê di devoka Hezroyê de peyda dibe, lê di gelekî devokên kurmanjîyê de jî tê dîtîn. Li gor, R. Zilan,² ev guherîn di bajarên Meletî, Mereş, Êntab û di navçeya Serhadê de jî belav dibe. M. Chyet³ radigihîne ku zayend di devoka Semsûrê de jî têk çûye. Di lêkolîneke berfireh de ku li ser devokê Amedê li darxistiye, M. Dorleijn jî digihîje wê encamê ku bikaranîna strûktûrên ergatîv û zayendê di pêvajoya têkçûnê de ye. (1996, r.57-60).

Wisa xwiya ku ev guherîn her çixas diçe di kurmanciyê de belav dibe. Niha, ji bo têgihîştina vê guherînê, em bînerin çend hîpotezan:

- 1- Hîpoteza pêşî, û ku di heman demê de ya herî xurt e, balê dikşîne ser guherîneke dengnasiyê (fonolojîk) ya bimerc (bişert). Em ji André Martinet (1960) dizanin, ku di navbera meyla zimanaxêvê ku serfa hêza xwe bisînor dike û pêdiviyên civatê yên ku dixwazin lazimiyên ji alî zimanaxêvan ve weke pêdiviyên zerûrî tên qebûlîkirin biparêzin de lihevnekirineke berdewam heye. Ev lihevnekirin bîngeha faktoreke înersiyê⁴ ye ku xwe digihîne qanûna xwezayiyê ya hewldana herî kêr. Ango, di pêvajoya axaftinê de, meyla axifêran her tim de serfkirina kêmtirin enerjîyê de ye. Loma, çî di veguhastina devkî ya rojana de, û çî di berhemên niviskî de, gelekî agahdarî hene ku axifêr hewce nabînin wan bînin zimên, ji ber ku ev agahdariyên derveyê ziman in û hemû axifêr wan baş nasdikin.⁵ Martinet destnîşan dike ku ev meyla axifêran

2- Ragihandina şexsî

3- Ragihandina şexsî

4- Mirov dikare peyva fransî « înersî » yê bi wateyên « pengîfî, sekanî, tiralî » wergerîne Kurmanciyê. Wateya înersiya zimannasî

5- Li ser vê mijarê, zimannasê rûsî Mikhail Bakhtine (1977) digot, ger di veguhastinê de her tişt her tim bihata gotin, dê veguhastin ne mimkin bûya.

dibe sedema hebûna faktora înersiyê ku di hemî organên peyvê de peyda dibe. Axifêr li hemberî vê înersiyê de di tekoşîneke bênavber de ye. Bi ya min, faktorê înersiyê di kurmanciyê de di-kare mudaxeyî guherînê [a] yê bi [ê] yê, [ê] yê bi [î] yê bike.

Ew dibe sedemê aboriya dengnasiyê û di bilêvkirina dengan de, meyla zimanaxêvan ber bi girtina devê ve vediguhêze. Ger em dengdarên ku me di nimuneyan de nirxandin carekî din bi bîr bînin, em dikarin tabloya faktora înersiyayê wisa nîşanbidin:

<i>Dereceya vekirina dengan</i>	Pirr vekirî	Vekirî	Navend	Girtî	Pirr girtî
Dengdar	a	e	ê	i, o	î, û, u
<i>Hêla faktora înersi yê</i>	▶	→	▶	→	▶

Ev hîpotez nîşan dide ku çawa guherîneke dengsaziyê dikare bibe xwedî bandoreke binyatnasiyê (morfolijîk).

- 2- Hîpoteza duduyan bi heman riya hîpoteza yekê de diçe. Bi awayekî giştî, di şûna peyvên weke; *rojekê, pismamekî, hevalekî/ê min* ku kurmanciya standard li ser mirov ferz dike, gelek çaran tê bihîstin ku peyvên wek: *rojê, pismamkî, hevalek min* tên bikaranîn. Bi nêrîneke rêzimanîyê, mirov dikare şaşiyên di avakirina van peyvyan de bibîne. Lê bi nêrîneke raveker (şîroveker), mirov dikare encamên aboriyeke (teserufeke) zimanasiyê ku xwe di peyvrêziyê û binyatnasiyê de nîşan dide bibîne.
- 3- Hîpoteza sisiyan ku dikare alîkariya têgihîştina wendabûna zayendê bike meyleke weke ya zêdebûna nêrîtiya di zimanê fransî de ye. Wek tê zanîn di vî zimanî de nêrtî rolekî giştî dilîze: *L'homme est mortel (mîrov fanî ye)*. Ji ber ku nêrtî ji bo heyyên zindî yên mê û nêr tê bikaranîn, G. Mauger di wê baweriyê de ye ku nêrtî di fransiyê de dibe zayenda nêtar. G. Dumézil di nêrîtiya giştî de avantajeke vegotinnasiyê (*stîlîstîk*) dibîne, *ji ber ku nêrtî bi kurtî heyi û tiştên nêr û mê bi zayendeka hevbeş diyar dike û ev bi xwe jî nauçîneke (wasîteyêke) rêzimanî ye ku xwe ji dirêjayîyan diparêze avadike* (1984). A. Marinet, di fransiyê de problemên ku ji ber zayendê peyda dibin, weke giraniyeke binyatnasiyê, piştrast dike û dibêje ku ji alî agahdariya digihîne zimanaxêvan, hebûna zayenda nêr û mê bi awayekî pratîk bikêrî tiştêkî nayê (1999, r.9).

- 4- Ev yek ne di nav pêşniyazên me de ye ku em meyla di fransiyê de tê dîtin derbasî kurmanciyê bikin, ji ber ku herdu ziman xwedî sîstemên cihê yên binyatnasiyê û peyvêziyê yên taybetî ne. Lê xwiya dibe ku nêrtî ku di nav prensîbên aboriya (teserûfa) zimannasiyê de cihê xwe girtiye bandoreke xwe ya pratîk li ser bikaranîna zimên jî dihêle: weke ku ew xwe nêzîkî kategoriyeke nêtar dike, ango wendabûna zayendê, qaideyên rêzimanî hêsan-tir dibin.
- 5- Têkiliya kurdî ya bi j zimanên ku cîranên wî ne re hîpotezeke din e ku divê mirov hesabê wê jî bike. Bi rastî jî, kurdî li Tikiyeyê bi tirkî re, li Iranê bi farisî re, li Suriyeyê û Iraqê bi erebî re di têkiliyê de ye. Ji xwe, di tirkî de cudakirina cinsan tune ye û ev yek ji aliyê din ve di farisî de jî ji zû de wenda bûye. Ger tirkî weke zimanekî serdest li Kurdistanê tesîrekê li kurdî bike, weke ku mirov dikare di warê ferheng, peyvnaşî û hwd. (Dorleijn, 1996), bi raya min di warê têkçûna zayendê de bandoreke wiha ya pratîk nexwiyaye. Bêgûman, mirov dikare hizir bike ku ji ber nebûna perwerde û weşana bi zimanê wan, Kurd dikevin bin bandora tirkî û nebûna zayendê derbasî zimanê xwe dikin. Lê dîsa jî, anke teke li gel kesên ku li Hezzoyê ji bilî kurdî zimanekî din napeyivin nîşan da ku ew jî zayendê ji hev cuda nakin. Divê em bi bîr bixin ku soranî bêyî ku têkiliyeke wê bi tirkî re hebe, ew jî êdî qet zayendê bi kar nayne.
- 6- Bi awayekî giştî, têkçûna zayendê di devoka Hezzoyê de, yek ji meylên pêşketina zimannasiyê ku bi awayekî pir vekirî ji alî Meillet (1958) û Sapir (1953) ve hatiye ravekirin piştras dike. Herdu zimannas, hebûna zayendê weke jibermayeke konseptên kevnar dihesibînin û li gor wan, zayend di pêvajoya pêşketina zimên de mehkumî li xwe kêmkirinê yan ji holê rabûnê ye.

Ger tevahiya van hîpotezan divê bîn piştrastkirin jî, ji ber ku di destê me de hêmanên (elemanên) ku têra pesendkirinê bikin tune ne, bi ya min hîpoteza dengnasiyê ya herî bihêz xwiyaye. Bi rastî jî diyar e ku faktora înersiyê dibe sedemê girtina kanala devê, herwiha jî kêmkirina dengdarên ku derfeta ji hev cudakirina zayendê provoke dikin. Li gor Meillet, ku ji bo wî guherînan kategoriyên rêzimanî hergav ji ber qezayên xwezayî yên dengnasiyê dibin, ev aboriya dengnasiyê her wiha di farisî û ermeni yê de dibe sedemê têkçûna zayendê, ji ber ku dawiya peyvê ku zayendê diyardike di pêvajoya pêşketina van zimanan de pir tengbûye (1958, r.207).

6. Encam

Wekî em dibînin, mijara zayendê ji bo minaqeşekirina guherînin kurmanciyê pîrr balkêş e. Gelekî eşkere ye ku zayend di axaftina devkî yê çend navçeyan de qels dibe. Gelo ev qelsbûn dê sibê bibe sedema têkçûna zayendê? Ger zayend di kurmanciyê de têk biçe, dê encamên wî çî bin? Dê ev zarave hêsantir an jî zehmettir bibe? Dema ku di kurmanciya devkî de ev guherîn diqewimin, em baş dizanin ku li aliyê din, ev zarave gihiştîye qonaxeke standardbûnê. Bi hezaran berhemên edebî ku bi kurmancî çap bûne danîşanên vê standardbûnê ne. Lê ziman di her du kodên devkî û nivîskiyê de pêşve diçe. Ji nebûna perwerdeyê û dezgehên neteweyî, ev her du kod îro ji hev dûr ketine û her yekê wan bi aliyek ve dimeşe. Di vê pêvajoyê de, biryar ya axifêrên zimanan e.

Bibliyagrafya

- AKIN S. (2002): «Motivations phonologiques de la neutralisation d'une catégorie grammaticale dans un parler du kurde», *LINX* n°45, r.147-155
- AKIN S. (2002): «Discours rapporté et hétérogénéité discursive en kurde», *Faits de langue*, n°19, r.71-84
- ARRIVE M., GADET F., GALMICHE M. (1986): *La grammaire d'aujourd'hui: guide alphabétique de linguistique française*, Flammarion, 719 r.
- AYKOC F. M. (1996): *Kurdîzan: rûberîna zaravên kurdî*, Weşanên Înstîtûya Kurdî, Berlin, 311 r.
- BAKHTINE M. (1977): *Le marxisme et la philosophie du langage*, Ed. de Minuit, 233 p.
- BEDIR KHAN, E. DJ., & LESCOT R. (1991): *Grammaire kurde (Dialecte kurmandji)*, éd. Jean Maisonneuve, Paris, 371 r.
- BIÇUK S. (1997): *Rêzimanê kurdî (kurmancî)*, Weşanên Înstîtûya kurdî, Berlîn, 275 r.
- BLAU J. & BARAK V. (1999): *Manuel de kurde kurmanji*, L'Harmattan, 225 r.
- CHISS J. L., FILLIOLET J., MAINGUENEAU D. (1978): *Linguistique française. Initiation à la problématique structurale*, tome 2, Hachette, 167 r.
- CONNORS K. & CRANSHAW A. (1997): «Gender divergence between cognates in French and Spanish», *Proceedings of the 16th International Congress of Linguists*, Pergamon, Oxford, paper n°0294.
- DORLEIJN M. (1996): *The decay of ergativity in Kurmanci*, Tilburg University Press, 183 r.
- DUBOIS J. (1965): *Grammaire structurale du français*, Larousse, 191 r.
- DUBOIS J., GIACOMO M., GUESPIN L., MARCELLESI Ch., MARCELLESI J.- B. (1974): *Dictionnaire de linguistique*, Larousse, Paris, 517 r. (nouv.éd.1991)

- DUMÉZIL G. (1984): «Madame Mitterrande? Madame Fabia?», *Le Nouvel Observateur*, 7.09.1984
- GUILFORD J. (1999): «L'attribution du genre aux emprunts à l'anglais», *La linguistique*, vol.35, fas.1, r.65-85
- MANALIU-MANEA M. (1997): «Un cas de "dégrammaticalisation": le résultatif roman entre voix et aspect», *Proceedings of the 16th International Congress of Linguists*, Pergamon, Oxford, paper n°0407.
- MARTINET A. (1960): *Eléments de linguistique générale*, Paris, PUF
- MARTINET A (1999): «Genre et sexe», in *La linguistique*, vol.35, fas.2, r. 5-9.
- MEILLET Antoine (1929): *Linguistique historique et générale*, Champion, Paris, r.199-229
- MAUGER G. (1972): *Grammaire pratique du français d'aujourd'hui*, Paris, Hachette
- QANATE K. (1991): *Gramera zmanê kurdî: kurmanci-sorani*, Koral Yayinlari, Istanbul, 335 r.
- TAN S. (2000): *Weneyên rezimanê kurmançî*, Weşanên Welat, Istanbul, 192 r.
- TATILON C. (1999): «Un genre bien à elles», *La linguistique*, vol.34, fas.1, r.107-112
- WALTER H. (1994): *L'aventure des langues en Occident*, éd. Robert Laffont, 595 r.